Şarkiyat İLMİ ARAŞTIRMALAR DERGİSİ
JOURNAL OF ORIENTAL SCIENTIFIC RESEARCH (JOSR)
**Cilt/Volume:** 16, **Sayı/Issue:** 01 (Haziran/June 2024)

# ANALÎZA METNÊN PIRTÛKA KURDÎ (KURMANCÎ) YA POLA PÊNCEM JI ALÎYÊ HÎNKIRINA ŞIYANEWERÎYA XWENDINÊ VE

**Şehmus Kurt**
Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü, Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı,
sehmuskurt@artuklu.edu.tr, https://orcid.org/0000-0003-1083-8133

**Article Types / Makale Türü:** Research Article / Araştırma Makalesi
**Received / Makale Geliş Tarihi:** 15 Mayıs 2024 **Accepted / Kabul Tarihi:** 02 Haziran 2024
**DOI:** 10.26791/sarkiat.1484932

# Analîza Metnên Pirtûka Kurdî (Kurmancî) Ya Pola Pêncem Ji Alîyê Hînkirina Şiyanewerîya Xwendinê ve


## Kurte

Xwendin yek ji şiyanewerîyên zimanî yên bingehîn e. Lewma di pêvajoya hînkirina zimanan da hînkirina xwendinê û pêşvebirina şiyanewerîya xwendinê, yek ji armancên sereke ye. Ji ber wê yeke jî di pirtûkên hînkirina zimanî da giranî li ser metnên xwendinê û çalakîyên li ser wan metnan e. Di pirtûkên hînkirina kurdî da jî heman rêbaz tê şopandin û ew pirtûk cih didin gelek cureyên metnan. Di vê xebatê da pirtûka dersên kurdî yên hilbijêrkî ya pola pencem wek mînak hatiye wergirtin û metnên xwendinê yên di wê pirtûkê da ji alîyê hînkirina şiyanewerîya xwendinê ve hatine analîzkirin û nirxandin. Ji bo vê armancê modela xebatên teswîrî hatiye hilbijartin û li ser modela venêrîn û teknîka analîza belge û naverokê ve metnên pirtûkê, cureyên wan metnan, çalakî û rahênanên wan metnan û hevsengîya di navbera wan da hatine tesbîtkirin. Di encamê da hatiye dîtin ku di pirtûkê da bi giştî 43 metnên xwendinê hene ku têde cureyên hevpeyvîn, helbest, çîrok, pêkenok, stran û metnên serbest hene. Li ser wan metnên xwendinê bi temamî 63 çalakî û rahênan hatine sepandin ku di bin banê 8 cureyên çalakîyan da kom dibin.


**Peyvên Sereke:** Xwendin, Şiyanewerîya xwendinê, Hînkirina kurdî, Dersên kurdî, Pirtûka kurdî ya pola pêncem.

# An Analysis of The Texts of The Fifth Grade Kurdish (Kurmanji) Textbook in Terms of Teaching Reading Skills


## Abstract

Reading is one of the basic language skills. For this reason, teaching and developing reading skills are among the most important goals in language teaching. Therefore, the language textbooks focus on the reading texts and the activities that are carried out with these texts. A similar method is used in the Kurdish textbooks and these books also contain different texts. In this study, the 5th grade Kurdish textbook has been selected as sample and the reading texts in this book have been analyzed and evaluated in terms of teaching reading skills. For this purpose, qualitative research has been chosen as the study design and the texts, text types and activities and exercises and also the balance between them have been determined based on the scanning model and the technique of document and content analysis. As a result, it has been found that the book contains a total of 43 reading texts consisting of interviews, poems, stories, anecdotes, songs and free texts. A total of 63 activities and exercises, grouped under 8 types of activities, were used in these texts.


**Keywords:** Reading, Reading skills, Kurdish teaching, Kurdish lessons, 5th Grade Kurdish textbook

## DESTPÊK

Xwendin ji deşîfrasyon, têgihiştin, watekirin û şirovekirina sembolên nivîskî pêk tê. Bi rêya metnê xwendinê, li ser zanînên berê, wate û têgehiştin têne avakirin. Ji bo xwendineke serkeftî zanîn û bikaranîna peyv, ravek, hevok, paragraf û herî dawî jî temamê metnê pêwîst e (Larsen-Freeman - Anderson, 2011). Mirov dikare behsa çar cureyên xwendinê bike: *xwendina sade*, *xwendina şiroveyî*, *xwendina rexneyî* û *xwendina afirînî*. Di jiyana rojane da metnên wekî rojname, gotar, name, ename, berhemên edebî (çîrok, roman, cerebe, helbest), tablo, grafîk, sembolan têne xwendin û ji bo têgihiştinê ew têne watedarkirin. Di plankirin û pêvajoya hînkirina şiyanewerîya xwendinê da divê mînakên ji wan cûreyên metnan hebin da ku pêwendîya wan û a tecrûbeya jiyana rasteqîn bê avakirin (Wallace, 2001, 21; Geyik, 2020, 123; Kurt, 2023, 65).

Di xwendinê da şiyanewerîyên wekî avakirina peywenda xwendinê (establishing the context), texmîna wateyê (prediction), vemalîn/hûrnêrîn (skimming), sehkirin/zûnêrîn (scanning), têgehiştina xwîneran (identifying the target audience), encamderxistin (inferring), têgehiştina peyama sereke (identifying the main message) hene (Carter – Nunan, 2001; Çakır, 2015, 275). Divê pêşvebirina şiyanewerîya xwendinê hewl bide ku van şiyanan jî pêşve bibe. Ji bo wê jî hinek rêzikên hînkirin û pêşvebirina şiyanewerîya xwendinê hene ku divê ji bo pêvajoyeke serkeftî ya hînkirinê bêne şopandin (Geyik, 2020, 129-139):

• *Xwendin pêvajoyeke aktîf e*: Lewma divê ew aktîfbûn di dersan da li lehê xwendekaran be.

• *Divê xwendekar bi xwendinê eleqedar bin.* Plansazîya wê yekê li ser milê mamosteyan e.

• *Divê pirs derbarê naverokê da jî bin*: Ne tenê pirsên li ser rêziman û peyvan, divê ji bo fehmkirina naveroka metnê jî pirs û çalakî hebin.

• *Texmînkirina peyv û naverokê girîng e*: Xwendin di esasê xwe da texmîn û fehmkirina peyvan an jî komên peyvan e. Lewma divê hevsengîya zehmetîya peyvên nas û nenas baş bê eyarkirin.

• *Divê pirs, çalakî û naverok li hev bên*: Pirs, rahênan an jî çalakîyên ku li ser metnê têne amadekirin hem li naveroka metnê hem jî li armancên hînkirinê bên da ku pêwendîdarîya metnê û eleqedarîya xwendekaran têk neçe.

Ji bo hînkirina zimanekî wekî kurdî, bi taybetî jî ji bo kesên ku qet bi kurdî perwerde nebûne û şiyanên wan ên zimanê kurdî yên wekî axaftin û nivîsînê kêm e, divê xwendin û pêşvebirina şiyana xwendinê baş bê plankirin. Herwisa divê metnên xwendinê yên di materyal û pirtûkên hînkirinê da têne bicihkirin jî li gorî armancên hînkirinê baş hatibine amadekirin, hilbijartin an jî adaptekirin da ku li wê hesasîyeta xwendekaran baldar bin û herwisa li gorî naverok û armancên hînkirinê bên yên ku di bernameya hînkirinê da hatine destnîşankirin. Dîsa divê şiyanawerîya xwendinê bi şiyanewerîyên din ên zimanî ve têkildar bêne hînkirinê (Baturay – Akar, 2007, 21).

Di vê xebatê da armanca me ya sereke ew e ku em li ser metnên xwendinê yên pirtûka dersa kurdî ya pola 5em hûr bibin û wan metnan li gorî armanc û rêbazên hînkirin û pêşvebirina şiyanewerîya xwendinê analîz bikin. Herwisa me pênc jêrarmancên xebatê dîyar kirine:

1. Hejmara metnên pirtûka pola 5em li gorî tema û ûnîteyan çawa dabeş dibin?
2. Cureyên metnên pirtûka pola 5em çawa dabeş dibin?
3. Metnên pirtûka pola 5em çiqas li armancên bernameya hînkirina kurdî tên?
4. Metnên pirtûka pola 5em li gorî rêbaz û teknîkên hînkirina şiyanewerîya xwendinê çawa dabeş dibin?
5. Metnên pirtûka pola 5em li gorî cihê çalakîyên xwendinê çawa dabeş dibin?

## 1. Çarçoveya Teorîk

Di her çalakîya xwendinê, ango pêşvebirina şiyanewerîya xwendinê da herî kêm sê pêngav hene. Çalakîyên li ser metnê xwendinê ne tenê piştî xwendina metnî dest pê dikin, lê di heman demê da berî xwendinê, di wextê xwendinê da û jî piştî xwendinê jî divê pirs, rahênan û çalakî hebin da ku aktîfbûna pêvajoya xwendinê bê avakirin (Toprak – Almacıoğlu, 2009, 23-24; Çakır, 2015, 274-280).

• Pêngava berî xwendinê (pre-reading): Pêngava balkêşandinê ye. Di vê pêngavê da zanînê berê têne çalakkirin, armanca çalakî û metnê çalakîyê tê dîyarkirin, li ser naverokê texmîn têne kirin û herî dawî jî peywenda metin û dersê tê sazkirin. Mamoste danasîna metnê xwendinê dike. Mamoste û xwendekar bi hev ra li ser metnî çalakîyên vemalîn (skimming) û sehkirinê (scanning) pêk tînin. Herwisa xebata peyvên nû û nenas tê kirin û peyvên wisa têne

destnîşankirin.

• Pêngava wextê xwendinê (during reading): Pêngava xwendina çalak e. Di vê pêngavê da peyama metin û naverokê tê kontrolkirin, hevok an jî peyv têne ravekirin û li ser hûrgilîyên metnê tê sekinandin. Xwendekar bi tena serê xwe metnî dixwînin da ku jê fehm bikin, ango deşîfrasyon, têgehiştin, watekirin û şirovekirina sembolên nivîskî dike. Hin caran rêbertîya mamosteyî hewce ye da ku wate aşkeretir be.

• Pêngava piştî xwendinê (after reading): Rahênan û çalakîyên piştî xwendinê ne. Di vê pêngavê da têgihiştina ji metnê tê xurtkirin, derbarê naverokên metin û mijarê zêdetir agahî têne pêşkêşkirin, beşdarî û çalakbûna xwendekar tê zêdekirin û herwisa çalakî û rahênanên ziman û rêzimanê têne kirin. Bi pirs û bersivan mamoste dixwaze asta têgehiştina xwendekaran bipîve. Têgehiştina xwendekaran ji alîyê peyv, rêziman, wate tê pîvan. Herwisa li ser mijar û naveroka metnî derîyê nîqaşan jî tê vekirin da ku têgihiştineke kûrtir a metnî bê bidestxistin.

Di çalakîyên her sê pêngavên xwendinê da hinek stratejîyên taybet hene ku karê mamoste û xwendekaran hêsantir dikin. Stratejîya dîtbarîyê (visualization s.); stratejîya nîşandanê (highlighting s.); stratejîya rêbertîya texmînê (anticipation guide s) (Kurt, 2023, 65-66):

• Stratejîya Dîtbarîyê (visualization s.): Mamoste mijara metnê pêşkeş dike. Bi rêya hin çalakîyan dîtbarîya metnê derdixe pêş. Ew, metnê bi deng dixwîne. Heke li ser metnî wêne yan jî xêzek hebe li ser tê axaftin.

• Stratejîya Nîşandanê (highlighting s.): Stratejîya wextê xwendinê ye. Hevokên ewil û dawîyê yên paragrafên metnî tên xwendin. Peyv û hevokên girîng tên destnîşankirin (**bold,** *îtalîk* yan jî rengîn). Divê mamoste zêde nekeve nav hûrgilîyan. Peyv û agahîyên nû têne destnîşankirin.

• Stratejîya Rêbertîya Texmînê (anticipation guide s.): Stratejîya pêngava berî xwendinê ye. Mamoste dixwaze pêşzanînên xwendekaran derxe meydanê. Metn divê li gora ast û pêşveçûna xwendekaran be. Berî xwendinê li ser naveroka metnê, peyv û termên sereke nîqaş tête kirin da ku xwendekar metnê bêtir fehm bikin.

Di bernameya hînkirina kurdî ya ku ji alîyê wezareta perwerdeyê ve hatiye amadekirin da hatiye destnîşankirin ku ew bername li ser bingeha Çarçoveya Hevpar a Zimanan (CEFR)[1] hatiye amadekirin û ji nêrînê wê metnê sûd hatiye wergirtin. Li gor bernameyê armanca dersê ew e ku xwendekaran di nava çar salan da (ji pola 5em heta pola 8em) ji asta A1 (destpêk/keşif)) a kurdî derbixin asta B1ê (derazîng) (MEB, 2012, 6-7).

Dîsa di bernameya hînkirinê da xwendin, ji watedarkirina peyv û hevokan wêdetir wekî şiyaneke fehmkirina armancê metnê xwendinê, analîz û şîrovekirina naverokên metnê hatiye pênasekirin ku ji bo pêşvebirina şiyanên din ên zimanî jî dibe alîkar (MEB, 2012,15). Li gor wê bernameyê, armancên hînkirina xwendinê wiha hatine rêzkirin (MEB, 2012, 16):

• Peydakirina armanca xwendinê (wek zanîn, kêfxweşbûn) û bikaranîna rêbaz û stratejîyên xwendinê yên guncaw,

• Ji bo pêşvebirina peyvdankê,

• Ji bo femkirina wê yekê xwendin yek ji awayên bidestxistina zanînê ye,

• Di metnê da zêdekirina hişyarîya hêmanên çandî,

• Bi rêya xwendina metnên ku zimanî baş û kêrhatî bi kar tînin ve zêdekirina şiyanên zimanî,

• Ji bo peydakirina fikrên rexneyî yên li ser metna ku tê xwendin,

• Pêşvebirina xwendina wekî ‘adet û xesleteke xweş,

Li gor bernameya hînkirina kurdî, pêşvebirina şiyanewerîya xwendinê derfetên baş dide ji bo nasîna çandên cuda, şopandina pêşveçûn û rûdanên li seranserî cîhanê. Dîsa xwendin dike ku zanînên ji xwendinê têne bidestxistin ji bo çareserkirina mijar û pirsgirêkên jiyanê bêne bikaranîn (MEB, 2012, 16). Ji bo wê yekê jî divê di hînkirin û pêşvebirina şiyanên xwendinê de, ango bi gotineke din di bikaranîna metnên xwendinê di ders û materyalên hînkirina zimanî da divê stratejî, rê û rebazên guncaw û kêrhatî bêne bikaranîn da ku sûdeke zêde bê wergirtin. Bernameya hînkirin ji bo wê yekê jî hin stratejîyan destnîşan dike (MEB, 2012, 17):

• Derbarê metin û nivîsê da wergirtina zanîneke giştî,

• Diyarkirina cureya metnê xwendinê û armanca ragihandinê,

1 Common European Framework of Referance for Languages (CEFR) ango bi wergera wê ya kurdî Çarçoveya Hevpar a Ewropî ya Referansên Zimanan astên zimanê wekî A1/A1, B1/B2 û C1/C li ser şeş astan dabeş dike. Ji bo zêdetir agahîyên li ser CEFR û naverokên wê bnr. https://www.coe.int/en/web/common-european-framework-reference-languages/level-descriptions.

- Di metnê da peydakirina fikrên sereke û alîkar,
- Ji bo wergirtina agahîyên bijarte,
- Lihevcivandina mijar û bûyerên di metnê da,
- Dayîna kurteyeke metnê xwendinê,
- veguhastina agahîyên di metnê da têne pêşkêşkirin,
- Bi rêya avakirina peywendê ve peydakirina peyvên nenas ên di metnê xwendinê da.

## 2. Paşxaneya Dersên Kurdî yên Hilbijêrkî

Lijneya Talîm û Terbîyeyê ya Wezareta Perwerdeya Neteweyî (WPN) ya Tirkîye'yê 25ê Hezîrana 2012an "Bernameya Heftane ya Dersan ji bo Sazîyên Xwendina Navîn (Seretayî-Navîn)" qebûl kir. Li gor wê bernameyê ji bo polên 5em derseke nû ya hilbijêrkî bi navê "Ziman û Zaravayên Zindî" hate vekirin.[2] Li nav wan ziman û zaravayan da navê Kurmancî (Kurmancca) û Zazakî (Zazaca) jî hebûn. Li ser wê bernameya navborî jî Rêveberîya Giştî ya Perwerdeya Bingehîn a Wezareta Perwerdeya Neteweyî, derheqê dersên hilbijêrkî û rê û rêbazên hilbijartina wan, giştînameyek belav kir.[3] Li gor wê giştînameyê heke herî kêm deh xwendekar dersekê hilbijêrin, hingê koma wê dersê pêk tê û ew ders tête vekirin. Herwisa di wê giştînameyê da hatiye dîyarkirin ku dersên hilbijêrkî yên sala perwerde û hînkirinê ya 2012-2013an divê meha Îlonê bêne nasandin û karûbarên hilbijartina wan bêne kirin.

Piştî weşandina giştînameya dersên hilbijêrkî, rê li ber xwendekarên pola pêncan yên xwendingehên navîn vebû ku ji hewza dersên hilbijêrkî dersa li gor daxwaza xwe hilbijêrin. Sala ewil li 80 bajarên Tirkîye'yê bi giştî 28 hezar û 587 xwendekaran dersa Ziman û Zaravayên Zindî hilbijartin û ji nava wan 18 hezar û 847 kesan Kurmancî û Zazakî hilbijartin. Digel ku sala ewil bû û raya giştî ya kurdan eleqeyeke zêde nîşan nedabe jî, ew hejmara xwendekaran, hejmareke hêvîbexş bû. Jixwe di salên dîtir da hejmara xwendekarên ku zaravayên zindî hildibijartin her diçû zêde dibû û sala 2014-2015em a perwerdeyê da gehiştiye 85 hezaran xwendekaran ku piranîya wan jî dersa zaravayên kurdî hilbijartibûn (Hürriyet, 25 Ocak 2015). Herçiqas hejmara xwendekarên ku dersên Ziman û Zaravayên Zindî hildibijartin zêde dibû jî, piştî sala 2015em ji ber pirsgirêkên rêveberî, materyalan û tayînkirina mamosteyan, êdî tenê li hejmareke gelek kêm a xwendindegahan dersa hilbijêrkî ya kurdî vedibe (Evrensel, 9 Eylül 2019). Li gor daneyên herî dawî di sala 2020î hejmara xwendekarên ku dersên kurdî hilbijartine daketîye nêzî 20 hezaran; sala xwendinê ya 2022- 2023yan 24 hezar kesan û sala xwendinê ya 2023-202an jî 24 hezar û 998 xwendekaran dersa kurdî ya hilbijêrkî tercîh kirine (Diyarname, 29 Reşemî 2024).

Ji bo wan dersên hilbijêrkî yên kurdî heya niha du setên pirtûkên hînkirinê hatine amadekirin. Seta ewil ji alîyê komîsyoneke ji mamosteyên Zanîngeha Mardîn Artuklûyê pêk hatî hatine amadekirin. Ew seta ewil ji bo zaravayên Kumancî û Zazakî pirtûkên cuda cuda bi serenavên *Kurdî/Kurmancî-5*, *Kurdî/Zazakî-5*, *Kurdî/Kurmancî-6*, *Kurdî/Zazakî-6* ve *Kurdî/Kurmancî-7*, *Kurdî/Zazakî-7* hatine amadekirin û di navbera salên 2012-2016an da wekî materyalên hînkirina kurdî hatine bikaranîn. Wê komîsyonê ji bo pola heştan jî bi navê *Kurdî/Kurmancî-8*, *Kurdî/Zazakî-8* amade kirin, lê ew ti carî nehate weşandin. Piştî sala 2016, vê carê li bin banê rêveberîya perwerdeya bajarê Batmanê komîsyonek hate avakirin û wê komîsyonê ji bo polên 5, 6, 7 û 8an pirtûkên bi heman navên jorîn pirtûk amade kirin û ew setên nû ji sala 2017an pê ve wekî materyalên hînkirina kurdî têne bikaranîn (Kurt, 2020, 266).

## 3. Rêbaza Xebatê

### 3.1. Modelê Xebatê

Ev xebata me li ser desenê teswîrî (qualitative) û modelê venêrîn (scanning) hatiye avakirin û bi rêya analîza belge û naverokan (document and content analysis) hatiye amadekirin. Modelê venêrînê ew e ku li ser mînakekê analîz bê kirin da ku helwest û nêrînên di qada giştî da bêne bidestxistin (Creswell, 2017). Analîza belge û naverokan jî ew e ku belge metin û dîmenên derbarê mijara xebatê bêne berhevkirin û analîzkirin (Sönmez - Alacapınar, 2018). Mirov dikare qeyd û tomarên fermî, name, bîyografî û otobîyografîyan, xebatên akademîk, pirtûk, kovar bernameyên derse,

2 Ji bo bernameya dersên hilbijêrkî ya sala 2012an bnr.: https://www.memurlar.net/common/news/documents/278182/25062012-69.pdf (Dîroka Xwegihandinê: 13.03.2020)

3 Ji bo giştînameya ser dersên hilbijêrkî ya sala 2012an bnr.: https://www.memurlar.net/common/news/documents/278182/meb-2012-37.pdf (Erişim Tarihi: 13.03.2020).

wêne û û fîlman wekî çavkanîyên analîzkirina belgeyan bi kar bîne (Best - Kahn, 2017, 272).

### 3.2. Materyale Xebatê

Materyala xebatê pirtûka dersên kurdî yên hilbijêrkî ya pola 5em e ku ji alîyê Serokatîya Lijneya Talîm û Terbîyeyê ya Wezareta Perwerdeya Neteweyî (WPN) a Komara Tirkîyeyê ve ji sala 2017an pê ve wekî pirtûka derse ya polên 5em ên xwendingehên navîn hatiye hilbijartin. Ew pirtûk ji alîyê WPN'ê ve sala 2018an hatiye çapkirin. Pirtûk ji alîyê komîsyonekê ve hatiye amadekirin. Di komîsyonê da ev kes hene: Gülbeddin Gülmez, Hasan Gümüş, Ahmet Eyer, Ramazan Yaman Lokman Kartal, Abdurrahman Özhan, Abdurrahman Kardaş. Pirtûk li ser neh temayan hatiye avakirin: (1) Em Zimanê Xwe Nas Bikin, (2) Ez û Malbata Xwe, (3) Xwendingeh û Jîngeha Min, (4) Laş û Tenduristî, (5) Xurek û vexurekên Me, (6) Salname û Demsal, (7) Geştûger û Hatûçû, (8) Lîstik û Çîrok, (9) Çalakîyên Serbest. Her tema di ûnîteyekê da hatiye pêşkêşkirin. Ji ber ku heya şiyanewerîya xwendinê di hînkirin û pêşvebirina zimanî û şiyanên din ên zimanê giring û bîngehîn e. Piranîya xwendekarên ku dersên kurdî yên hilbijêrkî werdigirin, di jiyana xwe da cara ewil bi metnên pola 5em rastî kurdîya nivîskî tên. Lewma me pirtûka pola 5em hilbijart ji bo analîza metnên xwendinê yên ku di dersên hilbijêrkî yên kurdî da têne bikaranîn.

### 3.3. Analîza Daneyan

Di vê xebatê da naverok û daneyên ku ji materyala xebatê hatine bidestxistin, bi rêbaza analîza naverokan ra hatine analîzkirin, nirxandin û şirovekirin. Di xebatên teswîrî da analîza daneyan bi rêxistin û sererastkirina daneyên bidestxistî dest pê dike. Pêngava duyem jî teswîra daneyên berdest e. Paşê jî pêngava şirovekirinê tê. (Best - Kahn, 2017, 290). Me jî daneyên ku ji materyala xebatê hatine bidestxistin, bi tabloyan rêxistin kirin. Paşê jî me wateya wan dane û hejmaran da û herî dawî jî me li ser wan daneyan şirove kirin.

## 4. Destkeftî û Peydakirinên ji Xebatê

Li vir em dê destkeftî û peydakirinên lêkolîna me ya li ser metnên pirtûka pola 5em ya dersên kurdî yên hilbijêrkî pêşkêş bikin û lê binêrin ka ew çiqas li teorîya hînkirina şiyanewerîya xwendinê û bernameya hînkirinê ya dersên kurdî yên hilbijêrkî (bnr. MEB, 2016) tên. Paşê em dê daneyên ku me ji derbarê metnên xwendinê û çalakî û rahênanên li ser wan metnan bi dest xistine, bi rêya tabloyan pêşkêş bikin û li ser wan daneyan analîz û şiroveyan bikin.

### 4.1. Destkeftî û Peydakirinên Derbarê Jêrarmanca Yekem

Li vir destkeftî û peydakirinên derbarê hejmara metnên pirtûka pola 5em li gorî tema û ûnîteyan hatine dabeşkirin û li ser tabloyên hatine pêşkêşkirin.

Tablo 1: Hejmara metnên pirtûka pola 5em li gorî tema û ûnîteyan

| **Tema** | ***f*** | **%** |
|---|---|---|
| 1. Em Zimanê Xwe Nas Bikin | 4 | 7 |
| 2. Ez û Malbata Xwe | 6 | 14 |
| 3. Xwendingeh û Jîngeha Min | 3 | 7 |
| 4. Laş û Tenduristî | 4 | 9.5 |
| 5. Xurek û vexurekên Me | 4 | 9.5 |
| 6. Salname û Demsal | 5 | 11.5 |
| 7. Geştûger û Hatûçû | 6 | 14 |
| 8. Lîstik û Çîrok7 | 16 | |
| 9. Çalakîyên Serbest | 5 | 11.5 |
| **Sercem** | **43** | **100.0** |

Gava mirov lê dinêre, di pirtûka pola 5em da 43 metnên xwendinê hene. Lê ew metin li ser tema û ûnîteyan bi awayekî hevseng nehatine dabeşkirin. Di temayên "Em Zimanê Xwe Nas Bikin" û "Xwendingeh û Jîngeha Min" da 3; di temayên "Laş û Tenduristî" û "Xurek û vexurekên Me" da 4; di temayên "Salname û Demsal" û "Çalakîyên Serbest" da 5; di temayên "Ez û Malbata Xwe" û "Geştûger û Hatûçû" da 6; û di temaya "Lîstik û Çîrok" da 7 metnên

xwendinê hatine bicihkirin. Ew nehevsengîya metnan a di dabeşkirinê da li ser giranîya metnên xwendinê û çalakîyên xwendinê yên di ûnîteyan da nelihevkirinekê pêk tîne. Ji ber wê nelihevkirinê dibe ku wextê li ser her temayê tê derbaskirin ji hev cuda be û ew jî bibe sedem ku çalakîyên nav polê ji alîyê dem ve baş neyêne plankirin.


## 3.2. Destkeftî û Peydakirinên Derbarê Jêrarmanca Duyem

Li vir destkeftî û peydakirinên derbarê cureyên metnên pirtûka pola 5em li gorî tema û ûnîteyan hatine dabeşkirin û li ser tabloyên hatine pêşkêşkirin.

Tablo 2: Cureyên metnên pirtûka pola 5em

| Cure | *f* | % |
|---|---|---|
| 1. Helbest | 8 | 18.6 |
| 2. Hevpeyvîn | 14 | 32.5 |
| 3. Çîrok | 2 | 4.6 |
| 4. Pêkenok | 6 | 14 |
| 5. Stran | 1 | 2.3 |
| 6. Metnên serbest | 12 | 28 |
| **Sercem** | **43** | **100.0** |

Ji alîyê cureyên metnan ve di pirtûka pola 5em da cureyên edebî û edebiyat gelêrî yên wekî helbest, hevpeyvîn, çîrok, pêkenok, stran û metnên serbest hene. Hejmara wan cureyên metnan wiha dabeş dibe; 8 helbest (%18.6), 14 hevpeyvîn (%32.5), 2 çîrok (%4.6), 6 pêkenok (%14), stranek (%2.3), û 12 metnên serbest (% 28). Di nav metnên xwendinê da giranîya cureyên hevpeyvîn, helbest û pêkenokan berbiçav e.




Gava em berê xwe didinê ka cureyên metnan li ser tema û ûnîteyan çawa dabeş bûne, tabloyeke zêdetir nehevseng derdikeve pêşberî me. Di her ûnîteyê da mînaka hemû cureyên metnan peyda nabin û eger hebin jî di heman hejmarê da peyda nabin. Bi giştî tê dîtin ku cureyên metnan kêm û sînordar in. Bo mînak, cureyên berbelav ên wekî menûyên xwarinê, nexşe, grafik û tablo qet nehatine bikaranîn. Digel ku di her ûnîteyê da mînakên hevpeyvîn û metnên serbest hene, di temamî pirtûkê da be stranek heye û ew jî di ûnîteyê heştan da ye. Dîsa çîrok yek ji cureyên herî kêm e di pirtûkê de, tenê li ûnîteyên 2, 3, 5 û 8an da mînakên çîrokan derdikevin pêşberî me.

## 3.3. Destkeftî û Peydakirinên Derbarê Jêrarmanca Sêyem

Li vir dê bê destnîşankirin ka metnên pirtûka pola 5em çiqas li armancên bernameya hînkirina kurdî tên. Li jor armancên bernameya hînkirina kurdî wiha hatibûn destnîşankirin (MEB, 2012, 16):

• Peydakirina armanca xwendinê (wek zanîn, kêfxweşbûn) û bikaranîna rêbaz û stratejîyên xwendinê yên guncaw,

• Ji bo pêşvebirina peyvdankê

• Ji bo fehmkirina wê yekê xwendin yek ji awayên bidestxistina zanînê ye,

• Di metnê da zêdekirina hişyarîya hêmanên çandî

• Bi rêya xwendina metnên ku zimanî baş û kêrhatî bi kar tînin ve zêdekirina şiyanên zimanî

• Ji bo peydakirina fikrên rexneyî yên li ser metna ku tê xwendin,

• Pêşvebirina xwendinê wekî ‘edet û xesleteke xweş

Gava mirov lê dinêre, metnên di pirtûkê da ji bo pêşvebirina peyvdankê hatine bicihkirin. Cureyên helbest, hevpeyvîn û pêkenok bi piranî ji bo vê armancê hatine dayîn. Dîsa metnên çîrok, stran û pêkenokan jî bo zêdekirina hişyarîya çandê hatine dayîn. Metnên serbest ên di pirtûkê da zêdetir metnên honakî ne ku ji alîyê nivîskarên pirtûkê hatine amadekirin. Di metnên serbest da jî armanc ew e ku bi rêya xwendinê zanîn û kêfxweşî bê dayîn. Lê di metnan da dayîna fikrên rexneyî û herwisa pêşvebirina xwendinê wekî ‘edet û xesleteke xweş zêde dernakeve pêşîya me.

## 3.4. Destkeftî û Peydakirinên Derbarê Jêrarmanca Çarem

Li vir dê bê destnîşankirin ka metnên pirtûka pola 5em li gorî rêbaz û teknîkên hînkirina şiyanewerîya xwendinê çawa dabeş dibin. Li tabloyên jêrîn cureyên rêbaz û teknîkên ku di pirtûkê da hatine bikaranîn û frekansa bikaranînê hatine pêşkêşkirin.

Tablo 3: Dabeşbûna metnên pirtûka pola 5em li gor rêbaz û teknîkên hînkirina şiyanewerîya xwendinê

| **Rêbaz û Teknîk** | ***f*** | **%** |
|---|---|---|
| 1. Çalakîyên peyvên nû | 13 | 20.6 |
| 2. Dagirtina valahîyan | 14 | 22.3 |
| 3. Pirs û Bersiv | 4 | 6.3 |
| 4. Sazkirina hevokan | 3 | 4.8 |
| 5. Hevyekkirin | 10 | 15.8 |
| 6. Rast û Çewt (RÇ) | 12 | 19 |
| 7. Nişandana peyvan | 5 | 8 |
| 8. Pirsên zelalkirinê | 2 | 3.2 |
| **Sercem** | 63 | **100.0** |

Gava em li çalakî û rahênanên ku li ser metnên xwendinê yên pirtûka pola 5em dinêrin, dîyar dibe ku ji bo têgihiştina metnan bi giştî 8 cureyên rêbaz û teknîkên çalakî û rahênan hatine tercîhkirin. Sercema rêbaz û teknîkan 63 ye, ji yên herî zêde hatine tercîhkirin ber bi yên kêm tercîhkirî ve rêza çalakîyan wiha ye: *Dagirtina valahîyan*, 14 (% 22.3); *Çalakîya peyvên nû*, 13 (% 20.6); *Çalakîya Rast û Çewt* (R/Ç), 12 (% 19); *Çalakîyên hevyekkirinê,* 10 (% 15.8); *Nîşandana peyvan*, 5 (% 8); *Pirs û bersiv*, 4 (% 6.3); Sazkirina hevokan, 3 (% 4.8); û *Pirsên zelalkirinê*, 2 (% 3.2). Wisa dîyar e ku nivîskaran herî zêde berê xwe daye çalakî û rahênanên wisa yên ku xwendekar têde pasîf in. Bo mînak çalakîyên *dagirtina valahîyan* û *rast û çewt (R/Ç)* ji wan çalakîyan in ku afirînerî yan jî analîza metnê hewce nake.

## 3.5. Destkeftî û Peydakirinên Derbarê Jêrarmanca Pêncem


Li vir em dê lê hûr bibin ka çalakîyên metnên pirtûka pola 5em li gorî cihê çalakîyên metnan çawa dabeş dibin. Di tablo û grafîka jêrîn da tê destnîşankirin ka çalakîyên xwendinê berî xwendinê, wextê xwendinê yan jî piştî xwendinê hatine bicihkirin.

Tablo 4: Dabeşbûna metnên pirtûka pola 5em li gor cihê çalakîyên xwendinê

| **Rêbaz û Teknîk** | ***f*** | **%** |
|---|---|---|
| 1. Çalakîyên berî xwendinê | 2 | 3 |
| 2. Çalakîyên wextê xwendinê | 5 | 8 |

| | | |
|---|---|---|
| 3. Çalakîyên piştî xwendinê | 56 | 89 |
| **Sercem** | 63 | **100.0** |

Dîsa gava mirov li gorî cihê çalakî û rahênanên ku li ser metnên xwendinên yên pola 5em hûr dibe, aşkere dibe ku hema bêje hemû çalakî piştî xwendina metnî hatine bicihkirin. Ji 63 çalakîyan, 2 lib berî xwendinê (% 3), 5 lib di wextê xwendinê da (% 8) û 56 lib jî piştî xwendinê (% 89) ne.




Ew nehevsengîya di navbera cihê çalakî û rahênanan, xwendekaran dike wergirên pasîf ên pêvajoya xwendinê. Ji ber ku xwendekar herî zêde di wextê xwendinê da çalak in, dive rêbaz û teknîkên xwendinê yên wextê xwendinê zêdetir bin. Herwisa divê çalakîyên berê xwendinê jî hebin da ku naverok û armanca metnê baştir bê fehmkirin.

## Encam û Nirxandin

Ev xebat li ser tespîtkirin, dabeşkirin û analîzkirina metnên xwendinê yên pirtûka dersên kurdî yên hilbijêrkî ya pola 5em hatiye kirin. Ew pirtûka ku alîyê Serokatîya Lijneya Talîm û Terbîyeyê ya Wezareta Perwerdeya Neteweyî (WPN) a Komara Tirkîyeyê ve ji sala 2018an pê ve wekî pirtûka derse ya polên 5em ên xwendingehên navîn hatiye hilbijartin û hêj jî wekî pirtûka dersê tê bikaranîn.

Digel wê armanca sereke, me pênc jêrarmanc jî dîyar kirine ku ew ev in: (1) Hejmara metnên pirtûka pola 5em li gorî tema û ûnîteyan çawa dabeş dibin?; (2) Cureyên metnên pirtûka pola 5em çawa dabeş dibin?; (3) Metnên pirtûka pola 5em çiqas li armancên bernameya hînkirina kurdî tên?; (4) Metnên pirtûka pola 5em li gorî rêbaz û teknîkên hînkirina şiyanewerîya xwendinê çawa dabeş dibin?; (5) Metnên pirtûka pola 5em li gorî cihê çalakîyên xwendinê çawa dabeş dibin?

Di encama vê xebatê da hate dîtin ku di pirtûka pola 5em da bi temamî 43 metnên xwendinê hatine bicihkirin. Gava mirov bala xwe didê ew metin li ser tema û ûnîteyan bi awayekî hevseng nehatine parvekirin. Di hin temayan da herî kêm sê, di hin temayan da herî zêde heft metnên xwendinê hene. Ew nehevsengî dîyar dike ku amadekarên pirtûkê plansazîyeke baş nekirine ji bo dabeşkirina metnan. Lê di lîteratûrê da tê dîtin ku metnên xwendinê li ser ûnîteyan bi awayekî hevaheng têne dabeşkirin da ku xwendekar derse û naverokan baş bişopînin û bizanin ka di her beşa tema an jî ûnîteyê da dê rastî çi bên.

Gava ji alîyê cureyên metnan ve li pirtûka pola 5em tê nihêrîn, cureyên wekî helbest, hevpeyvîn, çîrok, pêkenok, stran û metnên serbest hene. Lê di pirtûkê da cureyên wekî rojnivîsk, name û ename ku di hînkirina şiyanewerîya xwendinê da têne bikaranîna qet peyda nabin. Hejmara wan cureyên metnan ên heyî jî nehevseng e. Bi temamî 8 helbest, 14 hevpeyvîn, 2 çîrok, 6 pêkenok, stranek û 12 metnên serbest hene. Ew giranîya cureyên metnan ên wekî hevpeyvîn, helbest û pêkenokan dike ku xwendekar her carê heman cureyên metnan bixwînin û ji bi wî awayî ji xwendinê sar bibin.

Dîsa di encama lêgerîna li ser cureyên rêbaz û teknîkên hînkirina xwendinê da peyda bû ku di pirtûkê da bi temamî 63 çalakî û rahênan li bin banê tenê heşt cureyên çalakîyan da hatine bikaranîn ku ew jî ev in: 14 çalakîyên dagirtina valahîyan, 13 çalakîyên peyvên nû, 12 çalakîyên rast û çewt (R/Ç), 10 çalakîyên hevyekkirinê, 5 çalakîyên nîşandana

peyvan, 4 çalakîyên pirs û bersivan, 3 çalakîyên sazkirina hevokan, û 2 çalakîyên pirsên zelalkirinê. Ew nehevsengîya cure û hejmara çalakî û rahênan jî dike ku xwendekar her carê û di her dersê da hema bêje bi heman cureyên çalakîyan ve mijûldar bibin û bi wî awayî hem ji dersê hem jî metnê xwendinê sar bibin. Gava wisa dibe armancên ders û çalakîyên li ser metnên xwendinê pêk nayên.

Herî dawî jî li gorî cihê çalakî û rahênanên ku li ser metnên xwendinên yên pola 5em hûr dibe, hema bêje hemû çalakî piştî xwendina metnî hatine bicihkirin. Ji 63 çalakîyan, 2 çalakî berî xwendinê, 5 çalakî di wextê xwendinê da û 56 çalakî jî piştî xwendinê. Ew yek dike ku berîya ku xwendekar bi rêya çalakîyên berî xwendinê û yên di wextê xwendinê da têne kirin, ji naverok û peywenda metnan hayedar bin, ew hema rasterast metnê dixwînin. Ew yek dike ku têgihiştina ji metnan kêm bibe û bi wî awayî hem baldarîya li ser xwendinê hem jî heza xwendinê kêm bibe.

Gava bi giştî li metnên pirtûka pola pêncem tê nihêrîn, diyar dibe ku bikaranîna metnan û çalakîyên li ser metna tenê xwendineke sade pêşkêş dikin û xwendekaran ji xwendina şiroveyî û ya rexneyî bê par dikin. Dîsa ji ber kêmbûna cureyên çalakîyên li ser metnan, xwendekar bêtir wekî xwînerên pasîf dimînin û nikarin bikevin nav peywenda metnan, lewma jî ew ji şiyanên xwendinê yên wekî avakirina peywendê, texmîna wateyê, derxistina encaman û têgehiştina peyama sereke bêpar dimînin.

## Çavkanî

Baturay, Huri Meltem - Akar, Nurgun. “A New Perspective for the Integratıon of Skills to Readıng”. *Dil Dergisi* (136), 16-27. https://doi.org/10.1501/Dilder_0000000071

Best, John W. - Kahn, John.V. *Eğitimde Araştırma Yöntemleri*, çev. ed. Onur Köksal, Konya: Eğitim Yayınevi, 2017.

Carter, Ronald - Nunan, David. *The Cambridge Guide to Teaching English to Speakers of Other Languages.* Edinburgh: Cambridge University Press, 2001.

Creswell, John W. *Araştırma Deseni Nitel, Nicel ve Karma Y*öntem *Yaklaşımları* çev. ed.S. B. Demir, Ankara: Eğiten Kitap Yayınları, 2017.

Çakır, İsmail. “Okuma Becerisinin Öğretimi” dnd. *Dil Öğretimi*, Ed. Nilüfer Bekleyen, Ankara: Pegem Akademi, 2015.

*Diyarname*. “Rewşa ‘Dersa hilbijartînî’ çawa dimeşe”, (29 Reşemî 2024), 5.

*Evrensel*. “Seçtirilmeyen Seçmeli Dersler”, (9 Eylül 2019). https://www.evrensel.net/haber/386372/sectirilmeyen-secmeli-ders-kurtce.

Geyik, Resul. *Teorîya Hînkirina Kurdî- Kurmancî*, Mersin: Azad, 2020.

Gülmez, Gulbettin yd. *Pirtûka Pola 5. Kurdî Kurmancî,* 2. Baskı, Ankara: Milli Eğitim Bakanlığı Yayınları, 2018.

*Hürriyet*. “Yaşayan Diller Dersini 85 Bin Öğrenci Seçtî”, (25 Ocak 2015), https://www.hurriyet.com.tr/egitim/yasayan-diller-ve-lehceler-dersini-85-bin-ogrenci-secti-28045465

Kurt, Şehmus. *Türkiye’de Kürtçe Öğretim Deneyiminin İncelenmesi (1968-2018).*, Diyarbakir: Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, Teza Doktorayê, 2020.

Kurt, Şehmus. “Cihê Rêziman û Çar Şîyanewerîyên Zimanî di Hînkirina Zimanan da: Mînaka Hînkirina Kurdî” dnd. *Perwerde û Hînkirina Kurdî: Rê û Rêbazên Hînkirina Zimanî*, edt. Şehmus Kurt, İstanbul: Weqfa İsmail Beşikçi, 2033, rr. 59-74.

Larsen-Freeman, Diane - Anderson, Marti. *Techniques & Principles in Language Teaching* (3rd Edt.). Oxford: Oxford University Press, 2011.

MEB. *Ortaokul ve İmam Hatip Ortaokulu Yaşayan Diller ve Lehçeler Dersi (Kürtçe) Öğretim Program,* Ankara: Milli Eğitim Bakanlığı, 2012.

Sönmez, veysel. - Alacapınar, Füsün Gülderen. Örneklendirilmiş *Bilimsel Araştırma Y*öntemleri. Anı Yayıncılık, 2018.

Toprak, Elif Leyla – Almacıoğlu, Gamze, “Three Reading Phases and Their Applications in the Teaching of English as a Foreign Language in Reading Classes with Young Learners”, *Journal of Language and Linguistic Studies*. 5/1, April 2009, pp.20-36.

Wallace, Christina. “Reading”, dnd. *The Cambridge Guide to Teaching English to Speakers of Other Languages.* Ed. Ronald Carter - David Nunan. Edinburgh: Cambridge University Press, 2001. 21-27.

## Extended Abstract

Reading skills are important and fundamental in the teaching and development of language and other language skills. Most of the students who take selective Kurdish courses, encounter written Kurdish through 5th grade texts for the first time. For this reason, the reading texts of the Kurdish textbooks should be well-prepared in accordance with the needs and language level of the students.

This study was conducted to identify, classify and analyze the reading texts of the 5th grade Kurdish textbook which has been used as textbook for selective Kurdish courses in secondary schools since 2017. The book, which was prepared by a group of Kurdish teacher in 2016 was selected by the Education Council of the Ministry of National Education (MEB) for 5th grade students in secondary features 9 unites which are based on nine themes: (1) Let's Get to Know Our Language, (2) Me and My Family, (3) My School and Environment, (4) Body and Health, (5) Food and Drinks, (6) Calendar and Seasons, (7) Travel and Traffic, (8) Games and Stories, (9) Free Activities.

In addition to the aforementioned main objective, we have also set the following five sub-objectives:

- How are the text numbers in the 5th grade book organized by topic and objective?

- What types of texts are there in a 5th grade book?

- To what extent do the texts in the 5th grade textbook meet the objectives of the Kurdish curriculum?

- How are the texts in the 5th grade textbook organized according to the methods and techniques of teaching reading skills?

- How can the texts in the 5th grade textbook be categorized according to the location of their learning activities?

The content and data obtained from the study material were analyzed, evaluated and analyzed using content analysis. We organized the data obtained from the material with tables. Then we present the meaning of those information and numbers, and finally we explained about that data.

As a result of the study, it was found that there are 43 reading texts in the 5th grade book. A close look at these texts reveals that they are not evenly distributed across units and topics. Some topics have at least three reading texts and some topics have a maximum of seven. It seems that the authors of the book did not plan the placement of the texts well.

The texts in the 5th grade book appear in the form of poems, interviews, stories, anecdotes, songs, and free texts, depending on their type. However, the book does not include genres such as diaries, letters and emails, which are commonly used to teach literacy. The number of text types available is also unbalanced. There are a total of 8 poems, 14 interviews, 2 stories, 6 anecdotes, one song and 12 free texts.

In examining the book in terms of the types of methods and techniques used in teaching literacy, it was found that there are a total of 63 activities and exercises used under the umbrella of only eight types of activities: 14 fill-in-the-blank activities, 13 new vocabulary building activities, 12 true and false (T/F) activities, 10 word matching activities, 5 word demonstration activities, 4 question-answer game activities, 3 sentence construction activities, and 2 annotated question activities.

Finally, if we look at the distribution of activities and exercises on the texts in the 5th grade book according to their location, we can see that almost all activities take place after reading the text. Of the total of 63 activities, 2 are activities before reading, 5 are activities during reading and 56 are activities after reading. In this case, it can be seen that the students go almost directly to reading the text without being aware of the content and context of the texts with the activities during pre-study and reading. This is the case when understanding the texts.